
R: 3

**“Opozîsyona kurdî xwedî kêmasî ye”**



R: 4

**Borkana nerazîbûnê li rê de ye**



R: 5

**Li Rojava roj hilat**



R: 8

**Hicaba bi zorî, bêrêziye bi jinan**




Bidestveanîna Mafên Netewî Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal De

Hejmar: 188
5’ê Tebaxa 2012’an
Buha: 150 Tûmen


# Agirî

## Destpêşxeriyek din a PDK Îranê bo diyaloga li gel hevalên cudabûyî

**Di 14’mîn pilînoma Komîteya Navendî a PDK Îranê de gavek nû li dor diyaloga bi hevalên cudabûyî ji vê partiyê hat avêtin ku bi hêvî ye, ew jî wek derfetek girîng bibînin û gavên hewce jêre bavêjin.**

**Deqa daxuyaniyê li rûpel 2’ê de hatiye**


Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û giştî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne    www.kurdistanmedia.com/kurdî


# Egera êrîşê xurt e



**Serokê berê ya Mûsadê ragihand ku di 12 heftiyên dahatî de Îsraîl vê êrîşî ser Îranê bike**

Afrahîm Halûy, Serokê berê yê dezgeha Îtilatî ya Îsraîl (Mûsad)ê, di got û bêja xwe bi rojnameya Niyo york Taymz a Amerîkayî re ragehandiye ku; di 12 hefteyên pêşerojê de Îsraîl vê êrîş bike ser Îranê û hekî li cihê Îraniyan ba, vê pir nîgeram bûya.

Navbirî daye zanîn ku weke xuya, karbidestên Komara Îslamî hêz û şiyana dewleta Îsraîlê bi kêm dihesibînin, lewma hêj metoda negore xwe li got û bêjên etomî bi superhêzên cîhanê re didomînin.

Leon Panêta, Wezîrê Berevaniya Amerîkayê jî daye zanîn ku Îran yan divêt ji riya got û bêjan ve hin çalakiyên navikî ên xwe kêm bike yan jî dibe xwe amadeyî êrîşa leşkirî a Amerîka bona bidestnexistina çeka navikî bike.


Eve jî li halekê de ye ku got û bêjên li navbera Îran û gurûpa 5+1 heya niha bêencam mane, lewma egera êrîşê pirr xurt bûye.

## 48 ziyaretkerên rehîngirtî, endamên spaha pasdaran in

**Artêşa Azad a Sûriyê ragihand ku 48 Îraniyên rewandî li Demişqê de, endamên spaha pasdaran a Îranê ne.**




Wan bi weşandina fîlmekê li 5’ê Tebaxê de, eşkere kirin ku berevajî îdeayên rejîma Îranê, ew ne ziyaretker, belkî girêdayî spaha pasdaran in. ji ber ku li îtirafên xwe de basa vê yekê kirine. Lewma Artêşa Azad ragihand ger ku Îran desta ji piştewaniya Esed nekişîne, emê êrîşî damezrawên Îranî li Sûriyê de bikin û hemû Îraniyên i Sûriyê de bikujin yan zîndanî bikin. Îranê daxwaz ji Turkiye û Qeterê kir ku li azadkirina wan de rola xwe bilîzin.



**Dilsoz: Evîndariya xelkê bo Pêşmerge, hêz, enerjî û moralê dide min**

R: 9



## Sergotar

### Dem hatiye

**Arîn**

Îran, yek ji dewlemendtirîn welatên dinyayê, îro rojê li jêr modîriyeta nebaş a rejîma hakim de ketiye nav kirîzek kûr a aborî de. Rejîma ku xeyala bidestxistina çeka navikî, barek giran ji tehrîman xistiye ser milê xelkê Îranê û jiyan ji wan herimandiye. Nîzamek ku ger alfabeya siyasetê fam kiriba, baykotên cîhanî weke derfetek ji bo pêşketina Îranê nedida zanîn û bi mirijîn û rikên xwe, zêdetir civaka cîhanî nediazirand. Encama van siyasetan de, em dibînin ku niha ketiye nav qopiyekê ku çiqas dest û pêyan bikute, wê zêdetir têde biçeqe.

Encama ku hejarî, giranî, bêkarî û kirîzên siyasî û aborî û dehan diyardeyên xirab li dû re hatine û nîşan dide ku rejîmê re, xincî çeka navikî, tu tişt girîngtir nine. Lê nîzama ku karîna kuntirol kirina bazara mirîşkê nine û bûye bi kirîzek nû, neçar maye ku bi îhsasatên mesebî ên xelkê bilîze û bi heram kirina wê, bixwaze rewşê aram bike, çawa dê bikare li hember êrîşan û hêrsa pengurî a xelkê de berxwe bide?

Tirîbonên rejîmê van bûyerane bi siyasetên dujminan li hember Îranê de dihesibînin û banga berxwedan, nexwarin û nemezaxtinê ji xelkê Îranê dikirin, lê ji hêla din ve jî, beşek zaf ji pere û samana xelkê ji tundajoyên Efxanistan, Îraq, Felestîn, Lubnan û rejîmên Venezoêla û Sûriyê re tê mezaxtin.

Rejîma ku ji bilî xelkê û samana wan, sû îstifadê ji diyanetê jî dike û îznê bi xwe dide ku li biçûktirîn kar û barên jiyana xelkê de dexaletê bike, ma êdî dem nehatiye ku tevlî karwanê Qezafî, Mubarek, Bin Elî û ... bihê kirin?

# Destpêşxeriyek din a PDK Îranê bo diyaloga li gel hevalên cudabûyî

**Bi boneya dawîhatina 14'mîn pilînoma Komîteya Navendî a PDK Îranê, Deftera Siyasî a partiyê daxuyaniyek belav kir.**

**Deqa daxuyaniyê bi vî awayî ye:**

Ji raya giştî re radigihînin ku 14',mîn pilînoma Komîteya Navnedî a PDK Îranê bi beşdariya pirraniya Endamên Eslî, Cihgir û Şêvirmendên Komîteya Navnedî, berwar 31'ê Tîrmeha 2012'an, bi armanca biryarsitandin li ser wan meseleyên ku di destûra karê pilînoma han de hatibûn guncandin, destpê kir û piştî du rojan karê berdewam û cih bi cihkirina erkên wê, pilînomê roja 1'ê Tebaxa 2012'an, dawî bi karê xwe anî.

Di destpêka basa pilînomê de birêz "Mistefa Hicrî" Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, rapora "Komîteya Amadekarî a Kongireya 15" a PDK Îranê li ser birêveçûn û dawîhatina konferansên "Komîteyên Partiyê" li welatên cur bi cur pêşkêş kir û akama wan konferansan bi pilînomê ragihand.

Di birrgeyek din a karê pilînomê de sercem pêşniyaz û biryarên "Komîteya Amadekarî a Kongireya 15" di pêwendî li gel çawanî û awayê birêveçûna konferansên din ên sazî û organên partiyê ku berê ji aliyê Deftera Siyasî ve hatibû şirove û pesendkirin ket ber bas, û ra û boçûnên beşdarên pilînomê jêre hat wergirtin.

Piştî basek têr û tesel û beşdariya çalakane a amadebûyên pilînomê di basên pêwendîdar de metod û şêwazên guncaw ji bo birêveçûna konferansan destnîşan kir û biryara dawî ji vê yekê re hat standin.

Beşek din a karê pilînomê û di çarçoveya hêlên giştî ên siyaseta partiyê de bas ji şîweya çawaniya alîkarî û pêwendiyên PDK Îranê li gel partî û saziyên opozîsyona Îranî û aliyên siyasî ên Kurdistana Îranê hat kirin.

Pilînomê di wî warî de rê û cihên hewce pêşkêşkirin û bernameya pêşniyarî a Deftera Siyasî di vê pêwendiyê de pesend kir.

Di dirêjahiya basên pilînomê de, çawaniya pêwendiyên navbera partî û ew hevalên ku nêzîk 6 salan e ji PDK Îranê cuda bûne ket ber bas û piştî şirovekirirna rewşa deverê û



hewcehiya hewlidan ji yekrêziya hêzên siyasî ên Kurd li Kurdistana Îranê re, pilînom gihîşt vê akamê ku tevî bêakambûna gişt hewlên rêberiya partiyê bi armanca bidestxistina yekrêzî û nehiştina astengan li ser riya gihîştin bi vê armancê, bo carek din jî di pêxema berjewendiya giştî a tevgera Kurd de, di riya vekirina deriyê diyalogê li gel wan hevalan gavek din jî bavêje, bi vê hêviyê ku gava han rewşek baştir bo ji hevtêgihîştinê û derfetek guncaw ji nehiştina asteniyan pêk bîne.

Di vê pêwendiyê de pilînom hêvîdar û çavnihêr e ku hevalên berê jî, vê gava PDK Îranê bi niyet pakî werbigirin û pêşwaziyê lê bikin û ji serkevtina wê hewlê re, gavên bicih hilînin.

Pilînomê piştî bas û biryardan li ser mijarên ku di destûra kar de bûn, piştînîvroya roja Çarşemî berwar 1'ê Tebaxa 2012'an dawî bi karê xwe anî.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Deftera Siyasî**
**2'ê Tebaxa 2012'an**

# PDK Îranê: Bila Kurdên Sûriyê yekrêziyê weke hewcehiyek haşanekirî bo gihîştin bi azadiyê binêrin



**Deftera Siyasî a PDK Îranê di daxuyaniyekê de rewşa niha a Sûriyê ji Kurdên wê parçeya Kurdistanê re bi derfetek dîrokî da zanîn.**

**Deqa daxuyaniyê bi vî awayî ye:**
Xûşk û birayên hêja!
Keç û xortên netewa Kurd!
Pêtirî 16 mehan berxwedanî, cangorîtî û qehremaniya xelkê wêrek û azadîxwaz yên Sûriyê li dijî desthilata nedemokratîk a Beşar Esed, tevî kuştina hovane a xelkê ji aliyê hêzên rejîmê ve, pêpikên rejîma Beis a Sûriyê xistine lerizînê û hêviyên serkevtina yekcarî ji xelkê Sûriyê re pêtir kiriye.
Diyare eva jî ji azadîxwazên deverê re bûye cihê keyfxweşiyê û berdewamiya pêvajoya ramalîna dîktatoran û têkşikana pîlanên dostên dîktatoriyê, li dijî serhildana xelkê.
Wuha rewşek di Sûriyê de xincî nêzîkbûna giştî a xelkê wî welatî ji azadî û gihîştin bi armancê, derfetek dîrokî jî ji xûşk û birayên me ên Kurd li wî welatî de pêkanîye ji bo ku li bajar û deverên Kurdistanê bibê hebûna hêzên tepeserkar ên rejîma Beşar Esed nefesên azadiyê hilkêşin.
Rewşa han ji Kurdên Sûriyê re ku heya niha rejîma Beis ne tenê Kurd weke netewe nas nekiriye, belkî mafên hevwelatîbûnê jî bi wan nedaye, derfetek girîng û pirr buha ye.

Lewma PDK Îranê tevî nîşandana keyfxweşiya xwe ji pêşhatina derfeta han ji bo xûşk û birayên me ên Kurd li Sûriyê , hêvî dike ku Kurd bi hêjayî û hişyariyek tewaw ji wê fersendê mifahê bistînin. Ji bo mebesta han jî dive yekrêzî û yekdengiya xwe weke hewcehiyek haşanekirî ji serkevtin û gihîştin bi azadiyê binêrin.
Her di vê pêwendiyê de, di cih de ye ku hêza berevankar û xelkê Sûriyê ku di pêxema pêkanîna derfeta han bi giştî gorî dane û kedek zêde dîtine, hest bi wan zulm û siteman jî bikin ku ber bi rûyê xûşk û birayên wan ên Kurd di wî welatî de bûne, rê nedin ku piştî hiloşîna desthilata Beşar Esed jî, netewa Kurd li Sûriyê cardin berbi rûyê wan bêmafiyan bihê kirin.

**Partiya Demokrat A Kurdistana Îranê**
**Deftera Siyasî**
**25'ê Tîrmeha 2012'an**

# Talibanê li Tehranê nûneratiya xwe vekir

**Barpirsıyarên Efxanî û Rojavayî eşkere kirin ku Îranê rê dayê Talibana Efxanistanê ku nûneratiya xwe li bajarê Zahidanê veke.**

Ev kiryara rejîma Tehranê bersivek e li hember vajokirina payma hevkariya demdirêj di navbera Efxanistan û Amerîkayê de. Rojnameya Wall street Jornalê ragehand ku Komara Îslamî dixwaze mûşekên pêşketî bixe xizmeta îslamiyên binajoxwaz li Efxanistanê.

Armanca Tehranê ji vê kiryarê ew e ku li egera êrîşa Îsraîl û Amerîkayê de bo ser nawendên Etomî ên Îranê de, operasiyonên tolhildanê li dijî hêzên rojavayî li Efxanistanê de encam bide.



## Mistefa Hicrî:

# “Opozîsyona kurdî xwedî kêmasî ye, lê ji opozîsyona seranserî xurttir e”

Hevpeyvîn: Azad Kurdî

***Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, Mistefa Hicrî, ji navenda Polîtburoya vê partiya Rojhilatê Kurdistanê ji bo rojnameya Rûdawê axivî. Hicrî pirsên derbarê mijarên cûrbicûr ên rojeva xebata Rojhilatê Kurdistanê bersivandin.***

**‘Niha proseya jinavçûna hikûmeta Esed destpêkiriye’**

**Wisa dixuye ku egera rûxandina hikûmeta Sûriyê gellekî xurt e, lê Îran bi taybet û Rûsya û Çîn jî pê re, hewlan didin ku Beşar Esed li ser desthilatê bihêlin. Bi nerîna we rikeberiya navbera van sê welatan û rojava û welatên erebî ji aliyekî din berbi çi pêvajoyekê diçe?**

Sedemek sereke ya jinavçûna hikûmetên dîktator ev e ku valahî û nakokî dikeve hundirê hêzên qirker û pişta xwe didin hikûmeta desthilatdar û tevlî refên gel bibin. Di van du salên borî de ev nîşane ji hêza serkutker a Beşar Esed tê dîtin û roj li pey roj xurttir dibe. Heta di yek, du mehên borî de çend fermanderên bilind ên leşkerî ku xwedî desthilat bûn û ji kesên nêzîkî Beşar Esed bûn, dev ji piştevaniya vê hikûmetê berdan. Ji aliyekî din ve jî, ligel ku Rojava derfetek zêde dan Rûsya û Beşar Esed, ji bo ku dawî li kuştina xelkê sivîl û nerazî bînin, lê Esed qirkirina sivîl û xwepêşanderan dom kir û dike. Ji ber vê yekê zextên mezin ketin ser Rûsya û Çînê ku bi civaka navdewletî re hevdeng bibin û zext û zorê bixin ser rejîma Esed. Têkbirina projeya aştiyê ya Kofî Annan ji aliyê Beşar Esed ve di vê bareyê de pirr bi bandor bû. Loma em dikarin bêjin niha proseya jinavçûna vê hikûmetê destpêkiriye û eger rewş wiha dom bike, di demek kin de ew hikûmet dirûxe.

**Pirr car behsa alîkarî û destwerdana hêzên leşkerî yên Îranê di qirkirina xelkê nerazî û sivîl ê Sûriyê de tê kirin. Sedem çi ne ku Komara Îslamî wiha xurt piştgiriya rejîma Beşar Esed dike? Gelo belge destê we hene ji bo vê yekê?**

Bi neman û tinebûna hikûmeta Beşar Esed:

-Rejîma Komara Îslamî tekane hikûmeta dostê xwe ya Ereb ji dest dide.

-Nikare bi asanî Sûriyê mîna pirekê bikar bîne ji bo gihandina çek û alîkariyan bo Hizbullaha Libnan û grûpên din ên dostê xwe.

-Nifûz û piştevaniya Îranê li herêmê lawaz dibe, ji ber ku hevkêşe (balans) di wê deverê de bi zerara Komara Îslamî tên guhertin.

Loma Komara Îslamê bi hemû awayî alîkariyê dide hikûmeta Sûriyê. Ew hevkarî evqas zêde û eşkere ne ku gumana kesî ji vê çendê nemaye ku pêdivî bi belgeyan hebe. Îran bi xwe red nake ku alîkariyê dide hikûmeta Sûriyê. Salek berî niha, fermanderê Supaha Quds Qasim Suleymanî, ragehand ku Komara Îslamî li Sûriyê gotina yekem dike û ti kes ji berpirsyarên sûrî li ser vê gotinê mikur nehatin û red nekirin. Ev gotin nimûneyek ji belgeyan e.

**Bi baweriya we piştî rûxandina hikûmeta Sûriyê, wê guherîn li Îranê jî pêk bên? Hûn siberoja Îranê çawa dibînin?**

Mîna min berê jî behs kir, rûxandina rejîma Sûriyê dibe sedem ku guhertin di hevkêşeyên siyasî de li herêmê di asta navdewletî de pêk were û ev pêvajo bi zerara Komara Îslamî temam dibe. Loma hilweşandina wê hikûmetê dikare bi bandor be ji bo qels û lawazkirina pêgeha Komara Îslamî ji aliyekî û bihêzkirin û hêvîdarbûna xelkê nerazî yê Îranê ku bi şiyana xwe desthilata Komara Îslamî li Îranê biruxînin.

**‘Hikûmetên Rojava behsa guhertina rejîma Îranê ligel opozîsyonê nakin’**

**Vê dawiyê we serdana Amerîka û Brîtanyayê kir. Hûn bi fermî hatibûn vexwendin? Gelo planek Rojava ji bo sîstema dahatû ya Îranê heye?**

Heta niha hikûmetên Rojava bi giştî bawer in ku bi gotûbêj, zext û ambargoyan li dijî Îranê di warê siyasî û aborî de dikarin Îranê neçar bikin ku dest ji meyandina Uraniyûmê berde û bi kiryar jî li ser vê planê dixebitin. Loma heya niha bi ciddî behsa guhertina piştî rejîma Îranê nakin, an aliyê kêm ligel me wek hêzên opozîsyonê behs nakin.

**Çi plan û stratejiya PDKÎ heye ji bo pêşeroja siyasî ya Îranê, bi taybet bo bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê kurd li vî welatî?**

Li pey kongreya 13. ya partiya me, dirûmşa siyasî ya me bo dahatûya Îranê pêkanîna Îranek demokratîk a federal e ku di wê çarçoveyê de hemû netewe û yek ji wan Kurd dibin xwedî hikûmetên otonom û bi awayekî xweser karûbarên navçeyên xwe rêve bibin û li gor qanûna bingehîn a demokratîk di desthilata navendî ya Îranê de jî beşdar bin. Ji wê demê pê de em li ser vê bernameyê kar dikin ligel dost û hevpeymanên xwe ku hevalbendiya me pêkhatiye ji yekîtî û hevalbendiyek di navbera beşek berçav a partî û saziyên neteweyên Îranê de bi navê `Kongreya Neteweyên Îrana Federal`.




**‘Ji bo rûxandina Komara Îslamî, hevgirtina opozîsyona Îranê xala sereke ye’**

**Gellekî behsa êrîşa leşkerî bo ser Îranê tê kirin. Li gor we Îran bi êrîşa leşkerî wê birûxe yan bi rêya şoreş û serhildana navxweyî mîna raperînên ku di bihara erebî de pêk hatin?**

Ji bo rûxandina Komara Îslamî, hevgirtina opozîsyona Îranê û xebata hemû aliyan li dijî rejîmê xala sereke ye, lê pêwîstî bi alîkarî û piştevaniya hêzên biyanî bo serkeftina wê xebatê heye û pêdivî ye ev du bername bi hev re pêşde herin.

**Niha rewşa hêzên kurdî yên Rojhilatê Kurdistanê di asta opozîsyonê de çawa ye?**

Giranî û qursiya hêzên opozîsyona kurdî bi berhevdan ligel opozîsyona giştî bi tevahî xuya û berçav e, lê ew ne bi vê wateyê ye ku opozîsyona kurdî di rewşek dilxwaz û baş de ye. Di vê bareyê de kêmasî gellek hene û rewş ne cihê razîbûnê ye, opozîsyona kurdî di vê qonaxê de dikarî ji vêya ku heye yekgirttîr û bihêztir be.

**Wisa tê xuyakirin ku hêzên neteweperest ên îranî li hemberî xwestek û daxwazên siyasî yên Kurdan û neteweyên din ên Îranê bê bal in û naxwazin modelek federal hebe li wî welatî. Gelo di dawî de ewê bi çespandina mafên neteweyî di sîstemek federal de razî bibin? Hûn dahatû çawa dibînin?**

Rastî ev e ku ti yek ji gelên tirk, faris û ereb ne ewqas demokrat in ku desthilata xwe ya dehan û sedan salî ya zordar bi ser Kurd û neteweyên din yên stemlêkirî re parve bikin. Loma tişta ku di vê navberê de pêvajoyê yekalî dike ji aliyekî yekîtî û hêza Kurdan bi xwe ye û ji aliyekî din jî guhertinên navnetewî û herêmî ne. Lewra di dema niha de hevgirtin û xurtbûna Kurdan bi giştî, û li her parçeyekî jî bi taybet, bêhtir ji her çaxekî giring û çarenûssaz e.

**Heyamê çend salan dibe ku partî û rêxistinên Rojhilatê Kurdistanê hewla pêkanîna eniya hevbeş a Kurdistanî didin, lê heta niha ti encameke pozîtîv jê derneketiye. Asteng û pirsgirêk çi ne?**

Li gor min astenga sereke li ser pêkhatina eniya yekgirtî di navbera opozîsyona Kurdên Îranê de vedigere ji bo wan perçebûnan ku di dema 5-6 salên borî de di nav hêzên serekî yên opozîsyona kurdî de qewimîne û hilgirtin û lixwekirina navê partiya dayîk û eslî ji aliyê wan aliyan ku veqetiyane. Dirûşm gotin ji bo pêdivîbûna yekîtiyê ji aliyekê û pêkanîna astengan li ser rêya çêkirina eniya hevgirtî du tishtên ne guncaw in, loma heta niha encamek pozîtîv ji wan hewildanan derneketiye.

**We ragehand ku hûn amade ne ligel aliyê hemberî xwe, ku 6 sal berî niha ji PDKÎ veqetiyan, gotûbêjan bikin bo çareserkirina pirsgirêkên di navbera we de û herwiha daxwaza we ji bo vegeriyana wan bo nav PDKÎ. Hûn niha jî amade ne li ser daxwaz û biryara xwe?**

Me hevalên ji PDKÎ veqetiyabûn vexwendin, daku tevlî partiyê bibin û em hev bigirin û hemû bi hev re beşdarî kongreya 15. bibin ku bi zûyî tê lidarxistin û hemû biryarên kongreyê bipejirînin. Bi kêfxweşî hejmarek ji hevalan piştî wê bangewazê tevlî PDKÎ bûn, niha jî em li ser wê daxwaza xwe tekez dikin. Ji xeynî wê, em mijûlê amadekirina gelaleyekê ne ku piştî pejirandina wê em bikarin nêzîkî hevalên xwe bibin û bi awayekî rê bo gotûbêjan ligel hev vekin.

www.arsivakurd.org

# Borkana nerazîbûnê li rê de ye



Selîm Zencîrî

Li van çend mehên derbasbûyî de seqa û atmosfera aborî a Îranê girêdayî rewşa siyasî, hevrîşê şok û berejanên metisîdar bûye. Ji ber ku siyasetên şerengîzane û fitnegêrane ên rejîmê li asta navnetewî û afirandina kirîzan, bûne sedem ku civaka cîhanî hisar û baykotên tund û giran ên aborî bixe ser Îranê daku neçar bi paşdekişyana ji çalakiyên navikî bike. Lê mixabin rejîm her li hêla ajawe û fitnegêrana xwe de dimeşe. Ew yek jî bûye sedem ku tesîr ji aboriya Îranê, hawirde û hinarde û herweha daketina nirx û buhayê diravê wî welatî bike hilmsîna aborî jî weke diyardeyek tal xwe bide xuyandin.

Li doma vê pêvajoyê de kêmiya mewadên xwarinê li welat de gihaye kopika xwe û bona pêşgirtin ji kêmî û giraniya kalayan, take rê ew e ku hawirdeya welat bê zêde kirin, lê ew yek jî ji ber astengiya sêstema bankî bi Îranê re her roj xerabtir dibe. Asta dahata giştî a welat ku piranî ji ber firoşa neftê ye daketiye, gelek ji fabrîka û kargehên berhemanînê hatine daxistin yan li sînorê daxistinê de ne û ...htd. Her bi vê sedemê jî pêka serhejmarîiyan, li vê midehê de zêdeyî yek milyon karker li ser sînorê bêkarmanê de mane.

Giranî, hejarî, bêkarî û kirîza ku Îran bi tewahî dagirtiye, tesîr ji jiyana rojane a xelkê bi taybetî texa hejar û kêmdahat kiriye û ger wusa biçe pêş, vê tirajîdiyek mirovî biafire. Lê eva jî hêj nebûye sedem ku hêj serê berpirs û karbidestên rejîmê ji selûnê bikewe û ji vê xewa giran hişyar bin û fikrekê ji halê xelkê û çarenivîsa wan bikin, ji ber ku tu car xelk û qedera wan ji rejîmê re girîng nebûye û tenê parastina desthilata serberedayî a wan li serweyî her tiştî bûye, loma jî bi vê rewşê re ber bi rû ne. Rewşek ku tesîrgirtî ji bayokt û hisarên aborî ên navnetewî li hember sıyasetşn rejîmê li dijî Îranê ye, lê berpirsiyarên rejîmê berdewam haşa û înkara bandora wan li ser aboriya Îranê dikin.

Kirîz û rewşa serdest bi taybetî kirîza Mirîşkê li Îranê diselimîne ku tehrîman karê xwe kiriye û ger pêvajoya han bidome, wê hêj bitesîrtir be. Loma berpirsên rejîmê piştî banga Xamineyî li dor ''aboriya berxwedanê'', (ku daxwaz kir xelik berxwe bidin û vê kawdanê derbas bikin), tirîbonên fermî, mînberên mizgevtan, zanko û ... besîc kirine daku xelkê aram rabigrin û xwe ji hêrsa pengurî a wan biparêzin. Bêşik yekem çirûska vê nerazîbûn û hêrsê jî, li bajarê Nîşabor a Îranê de hat xistin ku neraziyan, berpirsiyarên rejîmê bi sebebkarê vê rewşê û bextreşiya xwe dan zanîn. Çirûskek ku bûye kabûsek bo rejîmê û renge li seranserî Îranê de bê lêdan. Çirûskek ku armanca tehrîman misoger dike. Ji ber ku ger heya niha tenê cudabîr û neyarên siyasî li qada xebata dijî rejîmê de bûn, vê carê neraziyên aborî jî pêre zêde dibin. Pêvajoyek ku rayedarên rejîmê û li serweyî hemûyan de Xamineyî pirr nîgeran kiriye, loma ji her metodekê bona ragirtin û pêşgirtina ji vê serîhildana xelkê û borkana nerazîbûnê digrin û bi soz û derewan dixwazin xelkê bixapînin, ji hêla din ve jî çavsoriyan dikin, gefan ji xelkê dixwen û herweha bi kar û siyasetên qirêje xwe jî, kirîza heyî kûrtir û bidomînin.

Serbarê vana, wekî xuya rejîma Îranê ders û şîret ji pêvajoya hiloşîna dîktatoran negirtiye û hêj jî bi hest û şiûr û têgihîştina xelkê Îranê dilîze û wusan difikire ku bi pilan, lîstok û siyasetên xwe dê bikare heya dawiyê tav û roja heqîqetê li pişt 'ewran rabigre û îdeaya vala ya xwe ku rêberê bisilmanên cîhanê ye berdewam bike.

Lê bo haydariya we rêberên nemirov û tarîperest, heta xelkê Îranê we bi nûnerê xwe nizanin, vêca çi bigîje bi bisilmanên cîhanê! Êdî tasika sebra wan lêwrêj bûye û xwe ji bo çarenivîsek tal ji were berhev dikin. Ji ber ku îro Nîşabor bû, sibe vê hemû Îran be û ew borkana hiloçîner û bihêz hinde nemaye ku serî hilde û dawiyê bi temenê dîktatoriya rejême bîne.



# Niqurçk

## Mehmûd bêt an Kirso? Bila bêt her yek in!!!





Ceifer Mubeşirniya

Kesên direwîn û bêşerm li kurdiya resen de bi şîrê helal nexwarî tên hesibandin û jêre dibêjin: Rivî ye çûye kewilê mirovan de, lê ji bo Mehmûd gerek bêjin, Rivî ye çûye kewilê meymûnê de.

Ji ber ku tu fehmek ji mirovahiyê negirtiye.

Mehmûdê çavhûr, dema çavên xwe didanê ser hev, xwe nizane derdora wî çi heye, axaftinan dike ku berevajî gişt rê û cihên mirovahî û pirensîpên navnetewî û nemaze siyasetên rejîma xwe ye jî.

Mehmûd got: Ezê nirxa Tûmen li hember Dolar de mîna berê lê bikim, yanî Mehmûd wê Dolarek 2000 Tûmenî, bike bi 1000 Tûmen.

Lê Tenê 12 demjimêr biser axaftina wî re derbas nebibûn ku Dolar di bazarên Îranê de ku du hemberî nirxa 2 salan berî niha bû, 18 tûmenên din jî pêwe zêde bû û her dolar ji 2000' tûmenî derbas bû.

Başe Mehmûd, ma te nebihîstiye ku ziman bisekine ser silamet e!!

Tu dê bo wan axaftinan bikî? kê tu neçar kiribûy ku basa bazara Dolar di Îranê de bikî? Bizna mamê xwe, xwe birêvebirî bi gotin nine, bi kar û xebat e, xwe carên caran nine ku direwên we heyamek bi ser de derbas bibin û ji bîra xelkê herin, ger caran we digot emê wuha bikin û hiniran bikin, xelik dixapiya, lê mal kimbax dema ku tenê piştî 12 demjimêran nirxandin, analîz û şekir şikandinan, virên te eşkere dibin û rewşa ku tu dixwazî baş bikî xirabtir dikî, çima tu destekî xwe nadî ber dewê xwe û yê din jî nadî ber .... xwe, ku ne bêtûne baxivî, ne jî zirtan berdî û bêhna wê dunyayê dabigre!!

Lê, ez bawerim her weke min gotî, Mehmûd Kirso riviye di kewilê Meymûnê de, tiştekê ji xwe hesiyaye, lewma rojek piştî wê bêhnberdanê, Kirso rabû tiştek got ku hinek aqil têde dixuya, wî got: Nabe em bigîjin qonaxekê ku dema me çavên xwe vekirin, em bibînin ku gişt dever li dijî me ye!

Kirso bila vê yekê jî ji te re bibêjim ku heya te aqil naskir, te dem derbas kir. Başe tu wê jî nizanî ku gişt dever li dijî we ye? Ka navê erdekê xwedê bîne ku cihê beşeran be û li dijî we nebe.

Beisa Sûriye, Hizbullaha Lubnanê, cîhada Îslamî, Elqaîde? Îro tenê hûn navên wan cihan tînin. Carek jî ji xelkê xwe binêrin ku berevajî xwasta we ku biqîrînin Sûriye, Xezze û Lubnan, diqîrînin Mirîşk, Piyaz û Pincar.

Vêca ji Mehmûd Kirso negrin hevalên "Niqurçkê", dema mirov karekê diherimîne, fikrê lê dike ka çilê bike, lê dema ku Mehmûd fikrê ji karekê dike diherimîne. Ez yezdanê mezin dikim, hemû dinya bêje min wusan nine, ezê bêjim ew Mehmûde, seranbin ji dayîk bûye.

Agirî 5

Hejmar 188, 5'ê Tebaxa 2012

# Li Rojava roj hilat



Ebdula Hicab

Bûyerên ku li Sûriyê diqewimin û tengasiya ku rêjîma Beşar Esed ketî nav, derfet ji bo gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê pêk anî ku li beşek ji cografiya xwe kontrola siyasî û ya birêveberiyê bigre destê xwe. Destbiser de girtina desthilatê li hin bajarên weke Efrîn, Amûdê, Dêrika Hemko, Serê Kaniyê, Kobanê û hin gund û bajarokên din ji bo gelê Kurd bi giştî û Kurdên Rojavayê Kurdistanê serkevtinek mezin bû. Dilxweşiya hê mezintir ev bû ku ev serkevtina mezin bi awayek şaristanî, dûr ji tundutîjî û bi riya serhildana medenî ve bi dest ket.

Piştî wê serkevtinê, her du eniyên siyasiye Kurd li Rojavaya Kuridstanê, Encumena Niştîmanî ya Kurd li Sûriyê (ENKS) û Encumena Gel ya Rojavayê Kurdistanê bi pêşengiya Partiya Yêkîtiya Demokratîk (PYD) li ser banga serokê Herêma Kurdistanê, rêzdar Mesûd Barzanî li hev hatin ku hevbendiyek neteweyî ava bikin û di bin siya wê hevbendiyê de bi hev re tev bigerin. Encama wê lihevhatinê bû damezirandina Desteya Kurdî ya Bilind (DKB) ku ji 10 kesan (ji her alî 5 kes) pêk tê.

Yek ji aliyên pêkhînerê DKB, hevbendiya ENKS ji çendîn partî û rêkxistinên siyasiye Kurdî pêk tê ku pêwendiyên germ bi Partî Demokratî Kurdistan û heya qederkê jî bi Yêkîtî Niştîmanî re hene. Hin ji wan partiyan li aliyê manewî ve, girêdayî tevgera Kurd li Başûrê Kurdistanê û bi taybet PDKê ne. Lê her yek ji wan xwediyê programa xwe ya xweser e, û tenê aliyê wan yê hevbeş pilana wan ji bo çareser kirina pirsa Kurd li Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê ye ku heya qederekê dişibe wê modela siyasî ku îrorojê li Başûrê Kurdistanê ava bûye.

Encumena Gel damezirawek nûavabûyî ye ku PYD'ê di pêvajoya xwebirêkxistin kirina piştî serhildana gelên Sûriyê li dijî rêjîma Beis ava kir. PYD di warê îdeolojîkî ve girêdayê rêbaza îdeolojîke Partiya Karkerên Kurdistan (PKK) ye û serokê PKK, Abdullah Öcalan wekî rêberê xwe dihesibîne. Modela siyasiye li gor dilê PYD'ê, Xweseriya Demokratîk e ku dixwaze li her devera ku Kurd lê dijîn bi xwe, xwe birêve bibin bêy ku wê modela birêveberiyê bi yek ji şêweyên kilasîke çareser kirina pirsên neteweyî, weke Otonomî, Federalîzm an serxwebûnê ve girê bidin.

Hevbendiya navbera ENKS û PYD'ê û piştre jî avakirina Desteya Kurdî ya Bilind ji aliyê gelê Kurd ve bi germî hate pêşwazî kirin. Bi awayekê ku piştî ragehandina vê hevbendiyê, piraniya tevgerên siyasiye Kurdî li Rojavayê Kurdistanê di bin siya DKB'ê de birêve diçin û aliyên siyasî bi pirr rengiyek siyasî û yekdengiyek neteweyî bi hev re tev digerin. Ji dilxweşiya Kurdan zêdetir, di raya giştî de û li asta navneteweyî jî wê hevbendiyê giraniyek taybet da tevgera Kurd û ew weke faktorek xwedî bandor di bûyerên pêşeroje Sûriyê de xiste rojevê.

Di gel wan destkevtên bi nirx û pêşketinên ku gelê Kurd di eniya siyasî de heya niha bi dest xwe ve anî, hê zûye ku cejna serkevtina yekcariye gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê bê girtin. Ji aliyekê ve hê navenda giringe desthelatê anî Qamîşlo di destê rêjîma Esed de ye, li aliyek din ve carê kontrola xalên sînûr û navendên stratêjîke leşkerî di dest artêşa rêjîmê de maye. Bi wî awayî îhtimala vegera desthelata dîktator an guherîna Kurdistana ewle bo navenda şer û milmilaniya di navbera rêjîmê û dijberan de heye.

Li aliyek din ve, metirsiya li ser tevgera Kurd li Rojavayê Kurdistanê bi tenê gef û hêrişên dereke ji aliyê rêjîmê û opozisyona tevlihev ve, an gefên destwerdana Turkiyê nîne. Ji xwe tirsa tolstandina rejîmê li gelê Kurd her tê û pitir kêmreng dibe, opozisyona Sûriyê ne di rewşek wisan de ye ku bikare ji Kurdan re bibe gef û ji bo Turkiyê jî ne musaide di rewşa niha de bikewe Sûriye û Rojavayê Kurdistanê (her çend Turkiye bi dil hez dike wî karî bike). Li asta Sûriyê, rêjîma Esed li Kurdistanê çi bingehek piştgiriyê nîne û tu Kurd li Sûriyê bi dil û heya serî li gel rêjîmê nabin. Opozisyona li derveyî hevbendiya Kurdî jî heya niha nekariye bala Kurdan bikêşe aliyê xwe ve. Heta danîna kesayetiyek Kurdîaxêv li serokatiya opozisyona Sûriyê ku bi piştewaniya Turkiyê hatiye ava kirin jî nekariye Kurdan bikêşe aliyê wê tevgerê ve. Kurdan li derveyî opozisyona Sûriyê, bi xwe sazî û rêkxistinên xwe yên neteweyî ava kirine û weke aliyek serbixwe di arîşeya navbera rêjîm û opozisyonê de tev digerin. Paniya Aşîl ya tevgera Kurd li Rojavaya Kurdistanê lerzokbûna hevbendiya neteweyî ye.

Di gel helwêstên neteweyiye hemû alî û partiyên pêkhînerê hevbendiya netewiye nûavabûyî, hewlên bi nirxe serokê herêma Başûrê Kurdistanê cenabê Mesûd Barzanî û piştgiriya aktorê din yê serekeye tevgera Kurd li Rojavayê welat anî PKK li hevbendiya navbera partî u hêzên siyasiye Kurd, hê ev tirs heye ku hevbendiya pêkhatî bi astengiyan re rû bi rû be. Destwerdana hêz û aliyên xêrnexwaz û dijberên mafê Kurdan jî dikare wê hevbendiya nûavabûyî bi astengiyên cidîtir re rû bi rû bike. Ji wê bi der, helwêstên dûr ji berpirsayetiya neteweyî, daxuyaniyên tûj, nebûna kultûra demokrasî û bi hev re karkirinê dikare astengiyan zêde bike. Serbarî wan metirsiyan, xurtbûna rengên rêkxistinan, bilindtir ragirtina reng û sembolên rêkxistinî bi ser reng û sembolên neteweyî de, hildana duruşmên rêkxistinî û berz û ferz kirina rengê îdeolojîk bi ser reng û daxwazên neteweyî de û hildana 2 alên ji hev cuda dikare piştî derbasbûna şahiya serkevtinê, netifaqî û dijberiyên navxweyî re rê veke.

DKB hê di destpêka karê xwe de ye, lewma xwediyê ezmûnek dewlemend ya deselatdarî û bi hevre karkirinê nîne. Di nava endamên Desteya Bilind de dijberî û nakokiyên berê hê bi yekcarî nehatine ji bîr kirin. Hesasiyetên li hember xurtbûna yek ji endamên Desteyê hê hene. Hêza parastinê ku nû ava dibe piranî li bin siya PYD û Encumena Gel de ye, lê aliyên din hewl didin ku ji bo parastina balansê hêzek cuda ji Yêkîneyên Parastinê yên girêdayî Encumena Gel ava bikin. Serbarî wan dijwariyan, siyaseta bi Erebkirina deverên Kurdî û cudakirina cografiya Rojavayê Kurdistanê bi ser 3 herêmên ji hev cuda de dikare bibe astengiya ser riya yêkîtiya tevgera Kurd li Rojavayê Kurdistanê.

Lê astengî çi dibin bila bibin, asoya pêşeroja Rojavayê Kurdistanê sav e û tava azadiyê roj bi roj pitir şewq dide. Tevgera sivîle gelê Kurd û avakirina ezmûneke xwemalî ya deselata sivîl ku dikare valahiya piştî hiloşîna sîstema dîktator tije bike wê hêviyê zêdetir dike. Li kêleka wan pêşkevtinan, derswergirtin ji ezmûna Başûrê Kurdistanê, hevbendiya neteweyî ku ji Başûr û Bakûrê Kurdistanê re bo Rojavayê welat tê nîşandan û rewşa navneteweyî ji bo tevgera Kurd li Rojavayê Kurdistanê derfetek wusan aniye pêş ku bi pêşeroja xwe bi hêvî be.

Destpêşxeriya sivîle tevgera Kurd û avakirina deselata xwemalî li deverên azad li gor pîvanên demokrasiyê û yasayên navneteweyî ye.

Li ser cografiyayek xwedî dîrok û nasname, dema xelkê welat bi îradeya xwe deselatek xwemalî ya sîvîl û demokratîk ava bike, zehmet e ku cîhan li hember wê îradeyê derkeve. Renge xala herî xurte tevgera Kurd li Rojava ya Kurdistanê jî hema ev destpêşxeriya demokratîk be. Ji ber ku herêma Rojava ya Kurdistanê tenê devera rizgarkirî li Sûriyê ye ku li wir şer û wêranî çê nebû, anarşîzm bi ser neket û hêzên tundajoye paşvero nekarîn bingehê lê hava bikin.

Ezmûna Rojava ne tenê ji bo gelê Kurd li wê beşa welat deriyekê ber bi roniyê ve vedike, belkû ji bo hemû Sûriyê dibe hêviyek nû. Ji ber ku hêzên Kurd dikarin hevbendiya ji bo ava kirina demokrasiyê xurttir bikin û li hember serîhildana tundajoyî û paşverotiyê bibin asteng. Ev hêz dikare ji bo pêşeroja Sûriyê, dabeş kirina deselatê û parastina hevsengiya di navbera komele û gurûpên cudaye welat de bibe palpişt.

Di asta herêmî de jî avabûna deselatek xwemalî li herêma Rojava ya Kurdistanê dikare ji bo ava kirina pira di navbera gelan û welatan de bibe alîkar. Lê di heman demê de deselata nû ya Kurdî dikare dijberên demokrasiyê û mafê gelan jî biazirîne. Her ji niha ve dengê şerxwazî li Turkiye û Îranê û li nava hin derdorên tundajoye Ereb li hember ezmûna sawa ya Kurdî li Rojavayê Kurdistanê bilind bûye. Li Turkiyê, ne tenê nejadperestên MHPyî, bigre derdorên qaşo demokrasîxwaz û pêşvero jî li hember hegerê avabûna deselatek Kurdî dengê nerazîbûnê bilind dikin.

Derfet û astengî li ciyê xwe, eger di rewşa niha de Kurd bi xwe yekdeng bin û hevbendiya ku nû ava bûye biparêzin, bê guman wê niha û pêşerojê qazanc bikin. Îro derfetek mezin li Rojavayê Kurdistanê bi dest ketiye. Baş bikaranîna wê derfetê ji aliyê hêzên Rojavayê Kurdistanê û xwedî derketin û parastina destkevtên nû ji aliyê hemû Kurdan ve erkek dîrokî ye. Êdî dem hatiye ku hemû Kurd, xwediyê çi meram û îdeolojiyê dibin bila bibin, girêdayî çi partî u rêbazên siyasî dibin bila bibin, lê hemû bi hev re yek deng û yekreng pişta hevbendiya nû ya Kurdî li Rojavayê welat bigirn û destkevtên ku bi dest hatî biparêzin û bikin bingeh bo pêngavên pêşerojê.

Niha wê roj li Rojava hil tê.



# Îran û kiryarên Terorîstî



Şehab Xalidî

Piştî wan teqînên bihêz yên roja 18'ê Tîrmehê li nawenda ewlehiya Netewî ya Sûriyê, ku têde wezîrê parastina rejîma Beşar Esed û cihgirê wî wezîrî, û wezîrê Îstiabaraxtê .... canê xwe ji dest dan, çend teqînên din jî li herêmên curbicur ên Îraqê de rû dan, û gellek kuştî û birîndar lê ketin.

Derheq wan teqînan balyozê berê yê Sûriyê li Îraqê de ku ji hikûmeta Beşar Esed cuda bûye, ragehand ku destê Îran û Sûriyê di wan teqînên li Îraqê de hebûye, jiber ku ew dixwazin ku bi wan teqînan bala bîr û raya giştî ya derve û navxwe vegerînin ser Îraqê.

Eva ku ew teqîn çende destê Sûriye û Îranê têde hebûye, carê nehatiye selimandin, lê pêka vê rewşa ku niha Îran û Sûriye têde dijîn, û li gorî sîstema deshilatê û hewildana wan ji bo domandina deshilatê û ji hemiyê girîngtir, li gorî pêşînr û rabihuriya ku rejîma Îranê bi taybetî li warê kar û kiryarên terorîstî de heye, dûr nine ku destê rejîma Îranê di wan teqînan de hebe, û bi wan teqînan armancên xwe ên siyasî bipêkin.



Çend rojan berî niha jî li Bolxaristanê teqînek li wesayitekê de çê bû, ku li encam de pênc Îsraîliyan canê xwe ji dest da, û piştî vê teqînê gellek ji çavkaniyan tiliya tawanbariyê bo aliyê Îranê dirêj kirin.

Ew teqîn jî rast li salvegera teqandina nawenda Cihûyan li Boynis ayrisa Arjantînê di sala 1994'ê de rû da. Li gorî zanyariyan û li gorî gotina polîsê Niyoyorkê eva di vî heyamî de neh kar û kiryarên terorîstî ên rejîma Îranê yan hatine eşkerekirin, yan jî hatine bê bandorkirin. Sandî Taymzê jî roja 22'ê Tîrmehê ragehand ku dewleta Îsraîlê, endamên saziya Îtilaati, û ewlehiya navxweyî (Şîn bit) şandine Londonê da ku canê sportvanên xwe biparêzin.

Ji ber ku Îsraîlê tirs ji ducarîbûna tirajidiya Olempîka Monîxê heye.

Di dema lîstikên olempîka Monîxê di sala 1972'an de yazde sportvanên Îranî li encama teqeya terorîstên Felestînî de canê xwe ji dest dan.

Li gorî gotina polîsê Niyoyorkê Sipaha Pasdaran ji destpêka sala 2012'an pêde heya niha li neh pîlanên bi dijî Îraniyên dijber û Cihûyan de dest hebûne, ku sê ji wan pîlanan li meha Çileya Paşîn, sê ji wan li meha Şibatê, û sê jî li meha Hezîranê de bûne, ku her hemû jî yan hatine eşkerekirin yan jî hatine bê bandorkirin.

Di vê derheqê de şirovekarên beşa ewlehiya polîsê Niyoyorkê raporek amade kirin, û dane Royterzê, ku di vê raporê de hûrdekariyên du kiryarên terorîstî li Bankûkê û kiryarên din jî li Nîyo Dêhl, Tiflîs, Bakû, Qibris, û Kinyayê de eşkere kirin, polîsê Niyoyorkê dibêje ku Îran û Hizbullahê dest di wan kiryarên terorîstî de hebûne.

Berpirsyarên payeberz yên Amrîkayî ragehandine ku rejîma Îranê gellek ji wan Ewropayiyên ku bûne misilman, bo aliyê xwe rakêşane û ji wan bona cîbicîkirina kiryarên xwe mifahê werdigire.

Her weha niha bi sedan malbatên berpirsyarên payeberz yên rejîma Îranê li Amrîka û Kanada de hene ku di gel balyozxaneya Îranê li Kanada, û di gel beşa parastina berjewendiyên Îranê li balyozxaneya Pakistan li Amrîka de hewkariyê dikin û zanyariyan didne wan.

Di rastî de ya ku di warê pêkanîna alozî û tevdanîkariyan ji destê rejîma Îranê bê, encam dide, da ku bikare bi vî awayî dirêjiyê bide deshilata xwe. Lê ya ku eşkere ye ew e ku ew hewildanên wan yên dûr ji exlaq, mirovatî, şer', û yasayê qet nikarin bo heta heta deshilata wan biparêzin, û derbazbûyiya dîktatorên herêm û cîhanê belgeya herî baş di vî warî de ye.




## Komara Îslamî û Elqaîde bi cezayê nextî ê 6 milyard dolarî hatin mehkûm kirin

**Dozgerek Federal yê Niyoyorkê ragehand ku gurûpek ji paşmayî ên bûyera terorîstî a 11'ê Septamberê, mafê wergirtina 6 milyard dolaran weke xeramet ji darayî ên Îran û Elqaîdê hene.**

Dozger Firank Mas, eşkere kir ku ji bilî 110 kesên mayî ji bûyerê, 47 malbat ji goriyên bûyerê bi taybetî jî malbata pîlotê balafira ku bi burca başûr a awahiya Tîcareta Cîhanî ketibû, dê qasek ji vî pereyî bistînin.

Li meha destpêka 2012'an de dozgerê deferal ê Amerîkayê li hukmekê de ragihand ku êrîşa 11'ê Septamberê bi tenê karê Elqaîdeyê nebû, serbarê wê ku Talîbanan cih dabûne vê rêxistinê, Elî Xamineyî û kopal bidestên wî weke Hizbulaha Lubnanê jî li wê êrîşê de dest hebûn.

Di doma gotina xwe de navbirî ragehand ku seba şêwaza mirina Osame Bin Laden û şerê Amerîkayê di gel rêxistina Talîbenê, darayî yên Komara Îslamî li derweyî welat seba beşdarî kirin di wê kiryara terorîstî de, dê bibe armanca tîma hiqûqî ya mayîyên bûyera 11ê Septamberê.



Rojnameyeke Îsraîlî:

## Kurdistan gihîşt deryayê!

Yek ji rojnameyên navdar ên Îsraîlê ''Haaretz'' nivîsand ku dibe ji ber pêşketinên dawî yên li Rojhilata Navîn de diqewimin, nexşeya herêmê ji nû ve were diyarkirin û diyar kir ku navenda wê jî Kurdistana "gihişt deryayê" ye.

Di nivîsa ji aliyê Seroka Bernameya Kurdan a Zanîngeha Tel Avîvê Prof. Ofra Bengio ve hat nivîsandin de, hat gotin ku Kurdan li Rojavayê Kurdistanê di carekê de gelek tişt bi dest xistine.

Di nivîsê de hat gotin ku Kurd êdî hatine astek wisa dikarin bi Şamê re bazareke baş bikin, ev yek jî pişta muxalefeta Sûriyeyê qahîm dike, peyamê dide Kurdên di nava sînorên Tirkiyeyê de û xwe nêzîkê Başûrê Kurdistanê dike. Bengio destnîşan kir ku dibe ev pêşketin, Kurdan bigihînin heta Deryaya Spî jî.

s

**Bengio bi bîr xist ku sînorê Başûrê Kurdistanê yê bi Tirkiyeyê re 400 kîlometre ye û li vî sînorî 800 kîlometreyên din jî zêde bûn û destnîşan kir ku ew yek Enqere xistiye nava gumanan.**

Bengio bal kişand ku hikûmeta Tirk heta niha polîtîkayên ji bo lewazkirina PKK'ê dimeşandin, lê van polîtîkayan PKK'ê bihêztir kir û da zanîn ku Tevgera neteweyî ya Kurdan li her derê Kurdistanê xwe bi cih kiriye.

Bengio ragihand ku Kurd dê sînorên hêzên di Şerê Yekem ê Cîhanê de danîn ji bîr bikin û ji bo van sînoran ji holê rabikin, dê vî şansê ketiye destê wan heta dawiyê bi kar bînin.




www.arsivakurd.org

# Darvekirina zarokên jêr 18 saliyê di Îranê de



**Hêmin Kurdî**

Lênihêrînek bi qanûna bingehîn a Komara Îslamî ya Îranê derdixe holê ku zarokên jêr 18 saliyê tên darvekirin û li gor zagonên vî welatî, temenê cezakirina zarokan, 15 sal ji bo xortan û 9 sal ji bo keçan hatiye diyarîkirin.

Eva di rewşekê de ye ku peymanname û konvansyonên navnetewey, îdamkirina kesên jêr 18 saliyê hatiye qedexekirin, lê rejîma Îranê li kêleka welatên Erebistana Seûdî, Pakistan û Sûdanê darvekirina kesên jêr temenê 18 saliyê didomînin û balê nadin peymannameyên mafê mirovan.
Dezgeha bi nav Dad a Îranê di salên dawî de û ji ber zextên navdewletî û protestobûna vê rejîmê di vê derbarê de, piştî mehkûmkirina zarokên jêr 18 saliyê bi cezayê îdamê, despêkê wan li zîndanî dike û piştî gihîştina bi 18 saliyê, darve dike. Rêxistina Neteweyên Yekgirtî di daxuyaniya dawî ya xwe de, bi fermî Îran mîna biryarder û rêveber cezayê darvekirina zarokan di asta cîhanê de nas kir.
Ji sala 1990`an heta 2009`an, 24 kes ji kesên jêr temen 18 saliyê li Îranê hatine îdamkirin ku 11 kes ji wan di dema daliqandinê de hêna jêr 18 saliyê bûne. Ligel ku RNY û gellekî komeleyên mafê mirovan li hundir û derve ji Îran û dewletên din xwestine ku dest ji darvekirina zarokan berdin û vî karî nemeşînin. Lê ev hewildan heta niha bêencam bûne, tenê li hinek xalan rêvebirina biryara wan tê paşxistin.

**Çawaniya mehkemekirina kesên jêr 18 saliyê**

Li gor gotina kesên ku cezayê han ji wan hatiye birrîn û temenê wan jêr 18 saliyê ye, hukmên wan demekê tên dayin ku nikarin agehdarê mafên xwe bin û berevaniyê ji xwe bikin û ne li ser encama wan îfadeyan difikirin ku pirr car bi zorî û ji aliyê Wezareta Îtilaatê ve bi neçarî ji wan tê wergirtin.

Ew nizanin ku ev îfade dikare bibe encama derkirina biryara darvekirinê li dijî wan. Hindek ji van zarokan ji dê û bavên xwe re gotine ku di bin îşkenceyan de hatine neçarkirin û bi derew îfade ji wan standine li ser mijara ku pê re hatine mehkûmkirin. Bo nimûne em dikarin behsa Atife Recewî Sehale bikin ku heyamekê berî niha ji aliyê hêzên parastinê ve hat binçavkirin, tûşî qemçîlêdanê hat û bi cezayê girtîgehê hat mehkûmkirin. Atife, demekê ku 16 salî bû, li ser şehadetdana cîranan di cihek giştî û li ber çavê xelkê hat darvekirin.

**Reaksiyonên sazî û rêxistinên navneteweyî**

Ligel daxuyaniyên dehan sazî, komele û rêxistinên mafê mirov û sivîl ên navneteweyî, Yekîtiya Ewrûpa bi cuda û Serokê Parlamena Ewrûpa ji Îranê xwestine ku xwe ji darvekirina zarokan biparêzin, lê hemû sêwe daxwaz bêsûd bûne. Çalakvanên mafê mirov dibêjin ji sala 2008`an pêde, nêzîk 107 girtiyên jêr temenê 18 saliyê li Îranê benda rêveçûna biryara îdamê bûne. Ji sala 1980`an heta niha, li gor agahiyên saziyek parastina mafê mirov a navnteweyî, Komara Îslamî ya Îranê berpirsyarê darvekirina ji sedî 73`ê zarokan bûye di asta cîhanê de.

## Rojev

# Rewşek wijdanhejên



**Dara Natiq**


Pêvjoya destbiserkirin, girtin û hepsîkirina cudahizr û azadîxwazên welatê me bi giştî û bitaybet tepeserkirin û qirkirina xelkê bêsûç yê Kurd û zext û givaşên ser çalakvanên siyasî û sivîl û fetisandina her cure dengekî azad û serbixwe di Kurdistanê de, ji aliyê saziyên ewlehî û tepeserkar yên rejîma azadîkuj a Komara Îslamî, weke siyaset û armanca bingehîn a vê rejîmê, bi mêtod û awayên cur bi cur herwisan didome.
Rejîma melayan bitaybetî piştî meş û serhildana gelên azadîxwaz yê herêmê û hiloşîna yek li dîv yek a koşka dîktatoran û bi encam gehîştina îradeya mafxwazane a xelkê zulimjêkiriye wan welatan, li her derfetekê bo dirkandina seha nerazîbûna xwe bi dijî vê rejîmê mifahê werdigirin, rewş û zirûfek polîsî bi ser welêt û bitaybetî netewên bindest de piraktîze kiriye.

Bi awayek ku pêka amarên tomar kirî di navenda amar a ajansa nûçegihaniya Kurdpa: tenê di heyva pûşper a îsal de, li herêmên kurdakincî yên Îranê, 78 hevwelatiyên Kurd, ji aliyê hêzên nizamî û evlehî yên rejîmê ve, bi sûçên weke çalakiyên siyasî, ferhengî û mafê mirov, hatine destbiser kirin. Le heyamê zêdetir ji 100 rojên borî de, nizîk bi 270 sal zîndanî kirin di bin navê 'pirsa emniyetî' bi ser zêdetir ji 50'î hevwelatiyên Kurd re hatiye sepandin.
Sepandina hikmê darvekirinê bi ser parek ji zîndaniyên siyasî û pêlên vê dawiyê yên îdaman bi hincetên têkdana tenahiya welêt, îşkencekirin û zirûfa aloz û nebaş a hepsiyên siyasî, nedana morexesiyê, qutkirina hevdîtina hepsiyan tevî malbatên xwe, riftara nebaş û kirêt a zîndaniyan li hember bendiyan de û bitaybetî girevgirtina vê dawiyê a babê mafê mirov yê Kurdistanê û sembol berxwedana nava çalereşên rejîmê, Mihemed Sidîq Kebûdwend, car din nigeranî û nerazîbûna raya giştî a cîhanê bidûv re bû.

Civaka Navneteweyî û tev saziyên mafê mirov, serbarê şermezarkirina kiryarên dijî mirovî û bitaybetî zirûfa nebaş û wîjdanhejên a zîndaniyên siyasî di Îranê de, daxwazkarê azadkirina tev zîndaniyên siyas û bitaybetî azadkirina Kebûdwend, sembol û hêmaya xweragirî a nava girtîgehên Komara Îslamî bûn.

Bêşik rejîma dîktatorî û mirovkuj a Komara Îslamî, bi domandina siyaseta tepeserkirin, girtin û kuştina azadîxwazên welatê me, dixwaze rewşek bitirs di nava civakê de çê bike û bi wî awayî pêşî ji îradeya mafxwazane a gelên Îranê bigre û bi xeyala xwe, pirîşkên meş û serhildanên herêmê ku dê rojekê pêsiya wan jî bigre, li xwe dûr bixin.

Lê bi xweşî ve xelkê zulimjêkirî û azadîxwazên yê welatê me, di heyamê zêdetir ji sê dehikan li domandina siyaseta tepeserkirin û kuştina, dane eyankirinê ku bi berxwedan û îradeyek bilind û xebata berdewam a xwe, heya gihîştin bi azadî û hiloşîna Komara Îslamî û anîneserkar a hikûmetek gelî û demokratîk yê tekoşîna xwe bidomînin.



**Di rapirsiyek Livînê de**

# Qazî Mihemed wekî sembola netewî hat nasîn

**Di rapirsiyekê kovara Livîn'ê de ku li ser tora Înternêtî a facebookê de, bi beşdariya pitir ji 27 hezar kesan hat encam dayîn, Pêşewa Qazî Mihemed wekî remz û sembola netewa kurd hat nasîn.**

Rapirsiya han ku di navbera 10 serkirdeyên kurd de hatibû encamdan, Pêşewa Qazî Mihemed karî yekem deng bîne.

Hêjayî gotinê ye ku li vê rapirsiyê de Mela Mistefayê nemir di pileya duhem û Selahedên Eyûbî ji di pileya sêyem de cî girtine.

www.arsivakurd.org

# Xemokî (depression)



Şine Dirudger

Xemokî yek ji nesaxiyên derûniye ku seba helçûn yan sedemên derekî yên taybet tûşî mirov dibe û herweha bi neman û jinavçûna sedemên wê, ew jî namîne. Xemokî yek ji nesaxiyên berbilav ên cîhanê ye.Nesaxiya xemokiyê taybet bi temenkê nine, belkî nesaxiyeke ku egera tûşbûnê di hemû temenên ciyawaz de heye, wate çi zarok, herzekar, genc û..., yan çi jin, çi mêr be.

Vir de berî wê ku derbasî nav basa xwebibm, hewce ye ciyawaziyekê bixin navbera haletên ku mirov bi dirêjiya rojê pêre berbirû dibe, ku ew jî haleta xembarî û diltengiyê ye.Xembariya han ku piraniya xelkêbi awayek demkî pêve dinalînin, beşek ji jiyana mirovek asayî. Çûnkî girêdayî ye bi guhertin û bûyerên jiyana rojê ku derbaz dibe û namîne, lê ev xembarî û diltengiya ku di şeklê xemokiyê de derdikewe, bi tewahî derûn û cesteya mirov dadigre û gelek bi kêmîfakterên derekî dikarin bibin hokar û sedema kêmkirin yan jî jinavbirina nasaxiyê.

Çendîn guhertin û nîşane di kesê xemok de çêdibin ku dikarin ji riya wan ve nesaxiyê destnîşan bikin. Ew nîşan û guhertin jî li gor cur û taybetmendiyên xemokî û her weha temen û sedemên tûşbûnê tên guhertin. Bo vê ku îsbat bihê kirin kesek tûşî nesaxiya xemokiyê bûye, dibe aliyê kêm 5 ji wan nîşanan di heyamê du heftiyande xwe derbixin ku ew jî pêkhatine ji:

1: Di piraniya demên rojê bi xasmanî di êwarî û demên dawiya rojê de dilteng û bêhinçik in û giringiyê bi cil û bergên xwe nadin, di dema axaftinê de serê xwe bilind nakin û bi stûxwarî digel beranberê xwe dipeyvin.

2:Hest bi xweşiyê di jiyana xwe de nakin û mifahê jê nastînin

3:Xew yan razanek normal namîne, zûji xewê radibe, yan ji direng radizê. Lê di hindek haletên xemokiyê de kesê xemok gelek hej xewê dike û dirazê.

4:Nemana heza xwarinê, wate gelek caran xwarinê kêm dike yan jî beravaj.

5:Di piraniya haletên xemokiyê de kêşa kesê xemok bi awayek berçav kêm dibe yan beravajî

6: Şiyan û hêza beşdarîkirin di bone û rê û resman de kêm dibe

7:Hest bi mandîtî û şeqîbûnê dike, lewma herikîn jî kêm dibe

8:Hestkirin bi sivikatî, bênirxî, bêhîvîtî û nebûna piştewaniyê.

9:Xwe serkut dike û bawerî bi xwe namîne

10:Mandîtî û bêzarbûn ji jiyanê û fikirîn ji mirin û xwekujiyê (di % 60 haletên xemokiyê de bîr ji xwkujiyê têkirin û 15 heya % 20 wan ji bîrokeya xwkujiyê cî bi cî dikin.

Peydabûna nexweşiya xemokiyê di encama komelek sedeman de çêdibe ku her yek ji wan sedeman çi bitenê û çi bi cuda, bandorê dixe ser berbilawbûna zêdetir ya nexweşiyê ku em dikarin bi destnîşankirina wan hokaran rê ji tûşbûnê bigrin yan çareseriya nesaxên xemokiyê bikin.

1:Hokar û sedemên herî sereke ku heyderên tûşbûn bi xemokiyê ne bi wî awayîne;

Sedemên derûnî û civakî: Mirov di jiyana xwe de bi awayek berdewam di gel rûdaw û bûyerên cur bi cur berbirû dibe. Weke ji destdana kes û karên xwe yên nêzîk, ji destdana serwet û samanê xwe, şer û awarebûn û ... ku dibine sedem mirov bikewe bin givaş û zextê û di encam de digel nexweşiya xemokiyê berbirû dibe.

2:Regez: rêjeya tûşbûyên nexweşiya xemokiyê di regeza mê de du heya sê hemberî regeza nêr e. Bi taybet ew jinên ku xwedî zarok in, bileztir ji jinên din di gel nexweşiya xemokiyê berbirû dibin

3:Tûşbûn bi nexweşiyên cesteyî: kesên ku nexweşiyên demdirêj weke nexwşiyên dil û pençeşêrê hene pitir dibine armanca nexweşiya xemokiyê

4:Bikaranîna derman yan elkulê: kesên ku bi awayek berdewan dermanên nexweşiyên cesteyî bikar tînin û herweha ew kesên ku berdewam elkul û madeyên hişber bikar tînin tûşî nexweşiya xemokiyê dibin

5:Kesatî: hatiye îsbatkirin ku piraniya kesatiyên weswas, Hîstirî û ... dikewin bin gefa xemokiyê.

Ev kesên ku digel nexweşiya xemokiyê berbirûne, bi xwe bi tenê û bi îradeye xwe nikarin di hember nexweşiyê de rawestin û çareseriya jêre bibnin, belkî bi derbasbûna mideheke ber bi xirabiyek zaftir diçin. Herçend nexweşiya han gelek giran û bi bandore, lê kesên ku di hizra çareseriyê de ne û hewlê jê re didin, dikarin bigehin encamek baş û ber bi başbûnê ve biçin.

Xemokî dikare ji riya mifahwergirtin ji dermanên xemokî, şokên elektirîkê û çareseriyên derûnî bihê çareserkirin. Bi awayek giştî %80 kesên ku xemok in, bersivdanek baş û guncaw hene bo derman û çareseriyê û %50 ji wan jî di midehê kêmtir ji salekê de ber bi başiyê ve diçin yan bi tewahî baş dibin.



# Hicaba bi zorî, bêrêziye bi jinan



Kejal Neqşbendî

Di dema şoreşa gelên Îranê di sala 1979'an de, jinan jî mil bi milê mêran beşdariyek berçav û çalakane di şoreşê de kirin ku encama wê jî herifîna rejîma paşatî û hatine serkara Komara Îslamî bû, lê piştî serkevtina şoreşê û vegeriyana Xumênî qonaxek nû ji meseleya jinan di civaka Îranê de derkrt holê, ew jî hicaba bi zorî bû. Bi zorîkirina hicabê wateya destxistine nava kar û bar û jiyana taybetî û takekesî ye ku eva jî bi civaka azad re nateba ye. Komara Îslamî ji bo kiryarên tund û tûjiya derheq vê yekê her ji destpêkê ve heya niha hertim îdeolojiya îslamî, tîtalên sunetî û kevneşop weke mêtod bikar tîne.

Ji ber vegeriyana yasayê ji bo şerîeta Îslamî û serdestiya îslama siyasî di Îranê de, ew deskevtên ku jinan di serdemê rejîma paşatiyê de bidest xistibûn, ji dest dan. Her ji despêka bidest girtina desthilatê ji aliyê hakimên Komara Îslamî ve, gaziya azadiya derbirînê, rêkxistin û azadiya tevalî hat kirin, lê piştî midehek kurt ku rejîmê xîm û pêpikên deshilata xwe bihêz û qahîm kir, hemû soz û qerarên xwe ji bîr û binpê kirin û yekem dijberiya xwe digel jinan de, ji bizorî û neçarîkirina hicabê de da xuyandin.

Bi dirêjahiya sê dehikên temenê Komara Îslamî, jinên Îranê seba hicaba nebaş û gor dilê melayan û gelek tometên din, rapêçî girtîgehan hatine kirin û digel işkence, destdirêjiyên cinsî, qamçî lêdan, kevirbaran û îdamê berbirû bûne.

Niha Îranê bûye girtîgehek tirsnak bo jin û azadîxwazan û jin bi tewahî hatine perawêz xistin. Lê serbarê van hemû ciyawazî û çewsandinan, jinên azadîxwaz bêdeng nebûne û bi awayên cur bi cur dest



avêtine nerazîbûn û daxwaza mafên xwe dikin. Hicaba bizorî wateya veşartina kesatiya rastîn a jinan e li pişt kesatiya direwîn, ku di rastî de ''Zahir perestî''a civakê digehîne. Bona zêdetir sepandina hicaba bi zorî û tirsandina jinan û herweha qebûlkirina wê ji aliyê jinan ve, di sala 1363'ê de bi pejrandina yasaya cezayên îslamî di Meclîsa Şêvra Îslamî de, bê hicab yan ''bed hicab''(Hicaba Nebaş) bi 72 qamçiyan tên sizadan.

Yasayên serdest di Îranê de, ciyawazî û helawardina li dijî jinan nehadîne kiriye û bi awayek fermî dewlet piştewaniyê jê dike. Li rex xanenişînkirina jinan û kêmreng kirina beşdariya civakî ya wan û çêbûna civakak mêr serdest, tund û tûjî xurt dibe. Tundûtîjiya han di encama nekarîn û bêşiyaniya mêran li hember givaşên malî de diçe nava malbatê û bi vî awayî tund û tîjî li hember jin û zarokan bi hêz dibe. Roj li dû rojê tarîperstên hikûmeta Îranê seba zext xistine ser jinan û zêdetir îzole kirin û şikandina kesatiya jinan, babeta hicabê li zanîngeh û îdaran de zeq dikin û pitir riyê ji jinan digrin daku bi awayek giştî jinan xanenişîn bikin.

Qeraetî derheqî vê cudakirinê dibêje ku; keç û kurr di qonaxên seretayî, nawendî û amadeyî ê de bi hevre nînin û ji hev cuda ne, lê çima di zanîngehê de ku şehwet û xerîzeya wan zêde dibe, bi hewre ne؟ Lewma dibe li gor regezan ji hev bên cudakirin.

Hikûmeta Komara Îslamî niha jî bi hinceta yeksankirina cilên jinan di zanîngeh û îdareyên hikûmetî de (yek reng û yek model) û cudakirina kur û keçan di zanîngehan de dixwaze givaşek xurttir bixe ser wan.

Di rastî de meseleya hicabê alaweke di xizmet melayan bi ser civakê de û herweha avbendek bihêz û astengek mezin bûye li ser riya pêşketina jinan. Heya niha jinan bi şêwazên cur bi cur hewil dane ku van hemû ciyawazî û teb'îzan kêmreng û pûç bikin û bêguman jin karakter û faktorên bihêz û xwedî bandor in di guhertin û guherînkariyên pêşeroja Îranê de.

Hevpeyvîn: Arif Vêlzî

Seyfûrî:

# Min wedizanî ku PDKÎ dê aşbetal bike, lewma difikirîm biçim nav partiyek din

Mihemed Beharî, naskirî bi Mihemed Dilsoz, kurê Mîney Hacî Salih, sala 1342'ê, li gundê Kerewyan a ser bi bajarê Seqizê hatiye dinê.


Dilsoz jî her wekî zarokên serdema xwe seba nebûna qutabxane û xwendingehê, mixabin ji neimeta xwendinê bêpar dimîne, lê di salên dawiya temenê rejîma paşatiyê de xwendingeh li gundê wan jî tê avakirin û wî çaxî bo mideyê çar salan dixwîne. Paşan seba giranî û zehmatiyên jiyanê dev ji xwendinê tîne û dest davêje karê cotyarî û pezdariyê li gund. Dûre heyamê çend salan seba kedkariyê rû ji bajarên Tehran, Kirmaşan û... dike.

Dilsozê dilşevitî û bi rastî dilsoj, piştî şoreşa gelên Îranê ku xebata PDK Îranê jî xurt bibû û komîteyên wê li bajar û gundan de hatibûn avakirin, kadr û pêşmerge jî di nava bajar û gundan de bi eşkere digeriyan û civîn bi xelkê re digirtin û siyasetên partiyê bi wan re parve dikirin, eşq û evîna pêşmerge û pêşmergatiyê di dilê wî de hêlûna xwe ava dike.

Yek ji van pêşmergan ku tesîrek mezin hebûye di çandina tovê welatparêziyê di dilê Dilsoz de, bi gotana navbirî kak Mîrza Elî Kesnezanî bûye ku her niha jî li refên partiyê de ye û ji riya Agirî ve silav û hurmetên xwe jêre şand.

Dilsoz Beharî çawaniya tevlîbûna xwe bi partiyê jî weha bas kir; Ji ber çalakî, şêwaza xebat, siyasetên dirust, bername, armancên PDK ku bersivek guncaw bûn bo daxwazên xelkê Kurdistanê, min PDK Îranê hilbijart û li sala 1358'an de min di şaneya gundê xwe de wekî endam navnivîsî kir. Sala 1359'ê dema bajarên Kurdistanê ji aliyê hêzên dagîrker ên Komara Îslamî ve cardin hatin girtin û pêşmerge ber bi gundan ve paşve kişiyan, meqerê partiyê li gundê me hat avakirin û min bi awayek fermî çeka PDK hilgirt û dest avêt nobedariyê û di 2 memûriyetên partiyê jî de beşdar bûm, lê seba kaliya babê xwe cardin ez zivirîm mala xwe. Bihara sala 1360'î, cardin ez hatim nava partiyê û bûm pêşmerge ku heya niha jî bê sekinîn li ser xebata xwe berdewam im.

Mihemed Dilsoz li dor zewicîna xwe dibêje: Sala 1372'ê, li Hirmê Dola ser bi herêma Serşîwa Seqizê, di gel xanima xwe Saniye Yadigar zewicîm û berhema jiyana min jî 2 kur û keçek in.





Dilsoz roj û bîreweriyên xweş ên jiyana xwe zaf da nîşandan, lê ya herî xweş weha bas kir: Dema em wekî pêşmerge diçûn bo menteqê û li gund û bajarên kurdistanê digeriyan, gelek bi germî ji aliyê xelkê dihatin pêşwazîkirin û şanazî bi pêşmerge û rêbaza pêşmerge ve dikirin, ez gelek bi van germî û pêşwaziyan keyfxweş û dilşa dibûm û min hêz û moral digirt. Wê çaxê min dizanî ku hekî bo PDKÎ û rêbaza şehîdan cangorî bibim, şanazî û serkevtinek mezine ji mirov re.

Li hember de rojên tal û bijan ên Dilsozê pêşmerge jî zaf in ku ya herî nexweş bi gotina wî ew e: Di meha Reşemeya sala 1373'an de ez berpirsê pirsgehên partiyê bûm li binkeya Deftera Siyasî ya partiyê. Kak Hesen Şerefî pêwendi bi min re girt û got ku berpirsek YNK'ê wê bê û Radyo Dengê Kurdistana Îranê dabixe û tu jî digel de here. Li hundur de ez dikeliyam lê ji ber ku biryar hatibû dayîn û givaşek zêde li ser hizbê hebû, ez naçar bûm ku bi wan re biçim.

> **Dema ku deriyê RDK Îranê daxistin, ez ji nerihetî û bêdesthilatiyê de gelek giriyam**

Dema ku deriyê RDK Îranê daxistin ez ji nerihetî û bîdesthilatiyê de gelek giriyam. Ji ber ku dujmin ji riya birayên me ve zext ji me re dianîn û me jî nedixwast birakujiyê bikin û neçar diman teslîm bin.

Mihemed Beharî bi vê gotinê dawî bi axaftina xwe anî: Daxwazê ji xelkê kurdistanê dikim ku pişta PDK Îranê bernedin. Partî û xelkê Kurdistanê Wek masî û avê ne û bê yek nikarin berdewam bin. Hêvî ji dike ku endam û alîgirên PDK Îranê bi giştî ku pêşrewên civaka Kurdistanê ne, berpirsane hizir bikin û qazanc û berjewendiyên giştî tim li serweyî her tiştî dabinên.



Mihemed Seyfûrî, kurê baram, di sala 1342an, li Gundê Koyîk a ser bi devera Zehaw ya bajarê Serpêla Zehawê hetiye dinê.

Mihemed Seyfûrî seba nebûna îmkanatên xwendinê û herweha nizimbûna asta rewşenbîriya civaka kurdî di serdemê xwe de, li xwendinê bêpar dibe. Lewre bi malbata xwe re dest davêje karê cotyarî û ajeldariyê heya temenê wî digîje 17 saliyê. Gava şerê navbera Îran û Îraqê dest pê dike û seba dagîrkirina herêma wan ji aliyê artêşa Îraqê ve, ber bi xaka Îraqê koçber dibin.

Kak Mihemed derheq çawaniya naskirin û tevlîbûna xwe bi PDK Îranê re weha bas kir; Sala 1360'î, ez li Gundê Sengera Jorî li mala mamê xwe bûm ku hejmarek ji pêşmergên PDK Îranê ber bi gund ve meşiyan. Yek ji wan pêşmergan, Kak Qadir Eliyasî bû. Min wî çaxî bo cara yekem pêşmergên PDK Îranê dîtin. Ev dîtina min bi pêşmergan re bû despêkek ku ez hesta netewî di hundurê min ajar bide û her roj bihêztir bibe. Min 2 radyo bi dest xistin û bi şev û roj li radyoyên kurdî gudarî dikir, lewma min şarezayîyek baş li ser partiyên kurdî ên her çar perçên Kurdistanê peyda kir û ez şiyam ku rêbaz, bername û armancên wan partiyan û herweha daxwazên netewa kurd bidim ber hev û di encam de partiya herî baş ku PDK Îranê bû, bo xebata xwe hilbijêrim. Serencam di 26'ê Sermaweza sala 1363'an de, bi awayek fermî min xwe bi binkeya Hêza Dalaho li "Miley Sertek" a Çiyayê Bemo da nasîn û ez bûm pêşmerge.

Seyfûrî li dor jiyana xwe ya hevpar dibêje; Di 27'ê Xakelêweya sala 1371'an de, ez bi Pîroz Seyfurî re, ku Dotmama mine zewicîm û berhema zewaca me jî kur û keçek in.

Kak Mihemed Seyfûrî roja herî xweş ya jiyana xwe weha vegêrand; li bal min hertim serkevtina pêşmerge û berdewamiya PDK Îranê dema herî xweş ya jiyanê bûye, lê têkilî û pîroziya pêşmerge di nav dilê xelkê kurdistanê de pir xweş bû, çunkî hewil dida ku ez refên PDK Îranê bi cih bihêlim û di partiyê de nemînim, lê rêz û hurmet û xoşewîstiya xelkê derheq pêşmerge, karek weha dikir ku cardin ez poşman bibim û bi awayek micid li ser xebata xwe berdewam bimînim.

Pêşmergê bi bîr û bawer kek Mihemed Seyfûrî bîreweriya herî nexweş a jiyana xwe bi vî awayî vegêrand: Roja cejna Qurbana sala 1368'an, min radyoya partiyê girtibû, di despêkê de radyoyê got ku rêberê gelê kurd Dr. Qasimlo li Viyena pêtextê Welatê Otrîşê bi destê terorîstên Komara Îslamî hatiye birîndarkirin, lê mixabin piştî midehek kêm partiyê ragehand ku Dr. Qasimlo hatiye şehîdkirin. Wê demê ez bi qasekê nerihet û dilteng bûm ku min hizir kir ku PDK Îranê vê aşbetalê rabigehîne û dibe ez jî biçime nava partiyek din yên kurdistanê. Terora Dr. Qasimlo karesatek pir mezin û biêş bû, lê hevdem karesata han tu caran di hizra netewa kurd de dernakeve û li seranserê kurdistanê rêbaza Qasimlo herdem zîndî ye û riya vê pirr rêvîng e.

Mihemedê xebatkar piştî 28 salan xebata xwe ya pêşmergatiyê dibêje: Çavnihêriya min ji PDK Îranê ew e ku heya misoger kirina armancên şehîdan, riya wan bidomîne.

Şoreşvanê mandînenas daxwazê ji xelkê kurdistanê dike ku tu caran pişt ji PDK Îranê nekin, ji ber ku dîrokek dûr û dirêje ji bo maf û daxwaziyên wan xebatê dike. Herweha şoreşgêrên kurd jî partiyê nekin alawek ji bo berjewendiyên xwe en teybet, çonkî partiya demokrat bo rizgariya netewî û azadiya nîştimanî û gelê me hatiye avakirin.

> **Dijwariyên xebatê gelek caran ez neçar dikirim ku dev ji hizbê û pêşmergatiyê berdim, lê xoşewîstiya xelkê ez poşman dikirim**



www.arsivakurd.org

# Şaristana Miyanduavê





Mecîd Cinîkanlû

Şaristana Miyanduavê yek ji Şaristanên herî giring yên Parêzgeha Urmiyê û Rojhilatê Kurdistanê ye. Ev şaristan wek dawîn beşa rojhilatê Kurdistanê tê hesibandin û dikeve sînûrê navbera Tirk û Kurdan. Miyanduav li başûra Parêzgehê cih girtiye û navenda wê herêmê bajarê Miyanduavê ye. Li ser navê bajêr, ew nav, navekî tam Kurdî ye ku xwe nîşanderê dîroka akincî bûna Kurdan li herêmê ye. Bi wateyek din Miyanduav ketiye navebera du çemên bi nav û deng yên ''Zerîne û Sîmîne'' ku eva xwe bûye sebebê vê yekê ku li dîrokê de bi bajarê Miyanduav bihê binav kirin. Wate bajarê ku ketiye navbera du çeman.

Ev şaristan li navbera bajarên Bokan, Milakn, Mihabad û Şahîndijê cih girtiye. Rûberê giştî yê şaristanê 2694 Kîlomêtrên çar goşe in û bilindahiya vê li Behrê 1314 metro ye. Xelkê herêmê piranî bi karê werzêrî û ajeldariyê mijûl in û li vê herêmê hin berhemên werzêrî û cotkariyê weke fîqî, Genim, Silk, Tirî, Sêv û gelek tiştên din berhem tên ku piraniya wan ji bo bajarên dinê yên Îranê têne şandin.

Piraniya herêmê bi destê Kurdane, lê di herêmên din de hin Tirkên Azerî jî jiyanê dikin ku li serdemê hatina Tirkan bo Îranê li vê herêmê akincî bûne. Kurdên herêmê hin ''Ehlî Heq'' û hin jî ''Elewî'' ne û hin Cihû û Behayî jî li vê herêmê jiyanê dikin ku piraniya wan li bajar de jiyanê dikin.

Elwiyên herêmê gelekî camêr û xwedî bandor in û hertim seba zext û zoriyên dewleta Îranê ketine ber gef û êrîşên jinavçûnê û zaf ji wan bi destê rejîma Îranê hatine kuştin.

Nifûsa Şaristanê pêka serhejimêriya sala 1385 a rojî 235158 kes e. Herêm li 3 bajar û 3 navçeyan pêk tê. Dîroka akincîbûnê li herêmê de gelek kevn e û hemû belge û dukomentên dîrokî bas ji kevnariya herêmê dikin. Peydabûna bi sedan şûnwarên kevn li herêmê, belgeyên dîroka Kurdan li herêmê nîşan dide.

Piştî hatina Tirkên Qerepapax bo herêmê û paştir li serdemê Axa Mihemed Xanê Qacar û piştî qetlîama bajarê Kirmanê, navhatî hejmareke zaf ji xelkê Kirmanê ji bo berengariya Kurdan ji bo vê herêmê şandin û seba wê yekê nifûsa Tirkan li herêmê zêde bû û hin bajarokên herêmê ketine bin destê wan.

Hebûna navên wek Rabirî, Sîrcanî û Kirmanî li hin tax û gerekên wî bajarî nîşanderê vê dewranê û hatina wan biyanîyan bo vê herêmê ye.Ev şûnwarên ku li herêmê de hene, zêdetir yên serdemê Madan in ku li hemû herêmê de hene û piraniya wan li gundê Daş tepe de cih girtine.


Miyanduav li serdemê Nadir Şahê Efşar de gundekî mezin bûye û li çaxê êrîşa Nadir Qulî bo ser Azerbaycanê li pirtûka dîroka Efşar li Kela Miyanduavê nav hatiye birin. Her wusa li pirtûka Şerefxanê Bidlîsî li rûpel 182'an de îşare bi navê vî bajarî hatiye kirin.

Li serdemê serhildana netewî a Simkoyê Şikak li sala 1912'an û piştre li herêma Miyanduavê de gelek kes tevlî refên şervanên Simko bûn û li artêşa Simko de xebat kirin. Her wisa bi dehan şerên mezin yên Simko li gel dewleta Îranê li wê herêmê rûdan ku li yek ji wan şeran de Xalo Qurbanê îxanekarê serhildana Cengel bi destê şervanên Simko li nêzîk Miyanduavê hat kuştin. Li çaxê damezirandina Komara Kurdistanê li sala 1945'an de gelek Kurdên wî bajarî beşdarî damezirandina Komarê bûn û li encam de li bajarê Miyanduavê gelek çalakiyên rewşenbîrî birêve birin.

Li wî serdemî de hemû ew herêm li bin deshilata Komara Kurdistanê de bûn û li bin rêberiya Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê û Pêşewa Qazî Mihemed de birêve diçûn. Li wî serdemê zêrîn de bo yekemîn car li herêmê qutabxanê Kurdî hatin vekirin û zarokên Kurd bi Kurdî dest bi xwendin û nivîsînê kirin. Ev dewranê zêrîn heta îro rojê jî li hizir û ramana xelkê herêmê de maye û bi çavê emegdarî mêzeyî xebata Pêşewayê Kurd, Qazî Mihemed dikin.Piştî serhildana gelên Îranê li sala 1979'an de gelek li xelkê vê herêmê tevlî şorşvanên PDKÎ bûn û li nav refên vê Partiyê de cih girtin.

## Piştî hatina Tirkên Qerepapax bo herêmê û paştir li serdemê Axa Mihemed Xanê Qacar û piştî qetlîama bajarê Kirmanê, navhatî hejmareke zaf ji xelkê Kirmanê ji bo berengariya Kurdan ji bo vê herêmê şandin

Lê mixabin rejîma teze bi desthilat gihîştî bi êrîş bo ser xelkê hemû Kurdistanê û bi taybetî Miyanduavê li vê herêmê gelek komkujiyên mezin afirandin û xelkê herêmê tûşî gelek tengasiyan kirin. Seba wan êrîşan xelkekî zaf li Kurdan li wan herêman çûne derê û akinciyên bajarên wek Mehabad, Bokan, Seqiz û bajarên dinê bûn û ew yek wek gefek li ser Kurdistanî bûna wê herêmê tê hesibandin.



www.arsivakurd.org

# Taybetiya Cil û bergên Jinên Kurdan



Sevda Kaplan


Belê taybetiya cil û bergên jinên Kurdan çi ne? Ji bo gel çima girîng e? Cil û berg jiyana mîlletekî dide nîşandan? Gelo li herêmê hîn tê bikaranîn? Divê mirov di destpêkê de bersiva van pirsan bide. Bi rastî cil û bergên Kurdan, dîroka ku bi sedsalan dide nîşandan. Neqşên ku li ser fîstanan hatine neqşandin, taybetîya modelên cilan, nîşanê me dide ku ev gel bi sedsalana hebûne û li herêma Mezopotamya'yê jiyane. Cil û bergên Kurdan, ji me re, rêça dîrokê dide xuya kirin.

Li herêmê , hîn jî jin û mêr ev fîstanên folklorîk bi kar tînin. Dinya her çi qas bi aliyê rojavayê de biçe jî, Kurd dev ji orf û adetên xwe bernadin. Bi taybetî jî jin dev jê bernadin. Em li demên berê dinêrin jin fîstanê xwe , mêr jî şal û şepikê xwe li xwe dikirin.

Lê niha li hinek deveran de, bi gelemperî jî mêrên dev ji şal û şepikê xwe berdane. Şûna şalê de pantor li xwe dike. Helbet jin jî dev ji fîstanên folklorîk yanî ji fîstanên reng bi reng berdaye. Hinek tişt hatiye guhertin, lê dîsa jî mirov nikare bibêje ku bi temamî dev jê berdaye.
Taybetiya lîbasan heye. Mînak, Bi gelemperî qumaşa fîstanên foklorîk reng bi reng e. Gelekî bi xeml e. Dirutina wê (wî) jî li gor herêman tê guhertin. Jinên Kurd, him bi rengên fîstanên xwe, him jî bi modelên fîstanên xwe, xwe didin xûyakirin.

Lîbasên jinan li gor deman cûr bi cûr in. Fîstanên ku di nav malê de tê li xwe kirin cuda bû. Yê ku li derva tê li xwe kirin jî cuda bû. Yanî bi kurtasî curên fîstanan hebûn. Jin an mêr li gor demê li xwe dikirin. Mirov dikare Mînakek bide; Jin dema ku diçû çolê an jî di nav malê de bû fîstanên bi xemil û teng li xwe nedikirin. Pêştemalek li ber fîstanê xwe girêdidan û karê malê an jî karê çolê dikirin. Ji viya re jî fîstanên malê dihate gotin.

Li ser fîstanan quşaxek girê didan. Jê re Piştemal dihat gotin. Piştemal; bi gelemperî li ser fîstanê dihat girêdan. Wekî sêgoşe dihate katkirin û dihate girêdan. Tiştên xwe yên taybet wekî pere, cîxare, seat...hwd dikirin kêleka piştemalê. Rengê wê jî bi gelemperî zer bû. Dişibiya agalê. Gelo taybetiya piştemal û pêştemal çibû? Ez wisa difikirim, pêştemal; ji bo ku dema kar



dikirin, nedixwestin ku fîstanê wan qirêj bibe loma li ber xwe girêdidan. Piştemal jî; ji bo ku him fîstan nekeve û him jî ji bo ku wezîfeya kemberê pêk bîne dihate girêdan.
Sedemên taybetiya piştemal yek jî ez dibêjim ku, jin an mêr dema ku barên giran diavêtin ser milê xwe, dixwestin ku bila piştemal piştgirî bide pişta wan, bi hêz dibûn. Ji bo vêya lazim bû ku tiştekî li ser pişta xwe girêbidin.

Ev jî piştemal bû. Yanî pişta xwe zexim dikirin. Însanên ku li gundan dijîn, kar û barê wan her tim giran bûye. Çol û baniyan de dişuxulîn. Ger kevir radikirin, ger telîsên genim, ceh, nîsk...hwd radikirin, ger erd diajotin, ger jî pez radikirin. Yanî bi kurtasî hewce bû ku cil û bergê wan jî li gor jiyana wan be. Mêrên Kurdan bi gelemperî şal û şepik bi kar anîne.
Agal avêtiye ser serê xwe, piştemal li ser pişta xwe girêdaye, goreyên hirî kiriye pê...hwd.
Jin jî kofiyê biheftreng daye ser serê xwe, bisk û kêziyê wê hebûne, fîstanekî heya bin çongê dirêj li xwe kiriye. Bin de derpêyek fireh li xwe kiriye. Wê jî wekî mêran li ser fîstanê xwe piştmalek girêdaye. Helbet ev modelên fîstanan, an şal û şepikan li her herêmê hatiye guhertin. Helbet girêdana wan jî hatiye guhertin. Lê meriv dema ku li van cil û bergên mirovan dinêre, mirov dizane ku ji kîjan herêmê ye an jî kîjan milletê ye. Lîbas carna rewşa wî milletî dide nîşandan.
Rengîniya fîstanan, cur bi cur bûyîna wan jî, li me dide fêhmkirin ku, çandekî çi qas dewlemend e. Dewlemendiya Çand û Kultûra Kurdan, mirov dikare bibêje ku ji cil û bergên wan jî tê fêhemkirin.

Helbet mirovên herêmê ne wek berê bi vê rengî dijî. Her tiş dibin bandorên derdora, piçekî hatîye guhertin. Mînak; jinên herêmê dîsa fîstanên dirêj li xwe dike, piştemal dîsa li ser pişta xwe girê dide. Lê belê wekî berê kofî nade ser serê xwe. Êdî kitanek sipî diavêje ser serê xwe. Hinekan li ser kitanê, ji perçeyên heftreng girê dide, hinekan jî her kitan tenê diavêje ser serê xwe. Mêr êdî şal li xwe nake.

Agal neavêje ser serê xwe şapqeyên şeşgoşe dide serê xwe an aw jî nade ser serê xwe.
Hew em dibînin ku mêrên îxtiyar şalê li xwe dike. Ciwanên niha bi temamî dev ji şalê berdaye. Bi tevayî pantor li xwe dikin. Agal jî neavêjin ser serê xwe. Carna di cejnan de hew bi kar tînin. Lê mixabin, em niha dibînin ku ev cil û bergên Kurdan êdî hew ekîbên govendan de maye……

# Efsaneyên Kurdî bi zimanê Îngîlîzî drket

**Dibistana Bilind ya Zimanên Biyanî ya Zanîngeha Colemêrg'ê, 8 efsaneyên ku 'Mem û Zîn' û 'Sîyabend û Xecê' jî di nav de ne, bi pirtûka bi navê 'The East Whispers' vergerandin zimanê Îngîlîzî.**



Dibistana Bilind ya Zimanên Biyanî ya Zanîngeha Colemêrg'ê, 8 efsaneyên ku 'Mem û Zîn' û 'Sîyabend û Xecê' jî di nav de ne, bi pirtûka bi navê 'The East Whispers' vergerandin zimanê Îngîlîzî.
Pirtûka ku çapa wê ji alîyê Zanîngeha Colemêr'ê ve hat kirin, di Pêşraxa Pirtûkan ya 3. ya Dîyarbekir'ê de jî cih girt. Pirtûk ji alîyê mamosteyên Dibistana Bilind ya Zimanên Biyanî ya Zanîngeha Colemêrg'ê M. Şirin Cengiz, Zeynep Saka, Salih Potukoğlu, S.Selman Üner û Yunus Bilgin ve, piştî xebata salekê hate amade kirin. Edîtorê pirtûkê Mehmet Şirin Cengiz got "Ji bo mirovên herêmê, Îngîlîzî wek zimanê sêyemîn e. Divê di naveroka pitrtûkên dersên Îngîlîzî de ji herêmê motîf hebin. Li ser vî fikrî me vê pirtûkê amade kir.
"

## Kaniya helbestan



## Namûs

Çar hezar sal berê, Yûnanan
ava kir gotina "namûs"
Sal 2009, namûs bûye kavûs

Dîrokê xwe nûh kir
Lê namûsê xwe tûj kir
Dibêjin ku Jin namûsa Mêra ye

Dev berde ji wan çîrokan.
Çi Jin çi Mêr
Êdî namûs bûye wekhevî
Jin bûye wek hêvî
Xedê mirovatî ava kiriye
Jin û Mêr wekhev çêkiriye

Xedê hez nake ji hovîtiyê
Diparêze cudatiyê
Rûmetê dixwaze ji bo
mirovatiyê

Amed, Batman, Suleymaniye…
Barajên laşên bê nasname
Bajarên goristanin bê navnîşan
Êdî bes e

Çawa tîrêjin rojê pêwîst e ji
bo kulîlkan
Azadî jî wisa pêwîst e ji bo
jinan.
Banga min ji we re
Ji bîr mekin

Jin hêviya jiyanê ye
rengê cîhanê ye
Namûs çi ye?

Namûs wekhevî ye
Namûs azadî ye
Namûs pêşveçûn e
Namûs mirovatî ye
Namûs rûmeta jinê ye
Namûs Jina azad e

09/11/09
samedi 20 septembre 2008
Helbestên Kurdî

www.arsivakurdi.org

# Agirî

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdi
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE
E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com








Jawero, Gundê Ewîheng

## Zanayek Îranî - Amerîkayî bû vebirê xelata sê milyon dolarî ya Fîzîke

**Dr. Nîma Erkanî Hamid, lêkolînerê enistîtota vekolînên pêşketî li zankoya Pirîniston a Amerîkayê, li gel 8 fîzînasên din, xelata 27 milyon dolarî a "Yorî Mîlnêr" bidest xistin.**

Nîma Erkanî Hamid, 40 salan berî niha ji dê û bavek Îranî ku fîzîkdan bûne, li Amerîkayê de hatiye dinê.

Ew li jiyê 30 saliyê de bûye mamostayê zankoya



Harward û heya niha xelatên cur bi cur li fîzîkê de bidest xistine.

## Nîgeraniya Lêborîna navnetewî ji rewşa jinan di Îranê de

**Rêxistina Lêborîna Navnetewî di rapora xwe ya bo komîsyona jinan di NY de, derheq rewşa jinên Îranê nîgeraniya xwe nîşan da.**

Di raporê de jinên Îranê weke çalakên mafê mirov û kêmanî, dikewin ber azar û îşkencê û tên zîndanîkirin.

Armanca rapora han vedigere ser nîşandana doma binpêkirina mafên jinan di Îranê de, bi Komsyona rewşa jinên NY, Jin herwusa seba arîşeyên fîrqeyî, Baweriyên olî, Rêgir ji azadiya raderbirîn û kombûnan û ... dikewin ber azaran.




## Keçeke Kurd li seranserê Îranê dibe 1'mîn




**Keça Kurd ji rojhilatê Kurdistanê bajarê Sine, li seranserê Îranê pileya yekemîn di imtîhana zankoyê de bidest xist.**

Ferzane Rehmanî ji nava mîlyonek û 65 hezar xwendevanan de yekemîn derket.

Ev yekemîn car e ku li Îranê de Kurdek pleya yekemîn bi dest dixîne. (avestakurd)

